

Em ji hev fam dikin!

Wergêran bi vîdyo û têlafonê li saziyên
perwerdehiya seretayî û dibistanê

Agahdariya dêûbavan û weliyan



Pêşniyar ji bo çi ye?

Dibe ku we berê di dema hevpeyvînan bi perwerdekarên re xwe çewt fêhm kiribe an jî we nekaribûya fikarên xwe wekî ku we dixwest bi zelalî ragihînin ji ber ku Elmanî ne zimanê weyê zikmakîye. Ji ber ku ev hevpeyvîn mijarên girîng ên wekî pêşkeftin û serfiraziya fêrbûna zarokê/a we an biryara der barê karîyera perwerdehiya wî/wê ya din de digire nav xwe, divê pêşî li têgihiştinên çewt yê zimanî were girtin.

Bi bikaranîna xizmetên wergêranê, dê hemî naveroka hevpeyvînê di navbera we û saziya perwerdehiya zarokê/a we de ji hêla wergêranê jêhatî ve bi têgihiştin û rast were ragihandin.

Wergêrana hevpeyvîna çawa dixebite?

Hevpeyvîn bi piştgiriya tercûmanek pir hêsan e: Ew dikare di saziya perwerdehiyê de bi piştgiriya wergêranê ya " girêdayî " were çêkirin an jî hûn dikarin vê pêşniyarê li malê bikar bînin. Ji bo vê armancê, ji we re " link yê vexwendinê " ku tê de dema wergêranê ya plansazkirî jî tê şandin. Hema ku hûn wê click bikin, dê wergêran dest pê bike. Hûn dikarin bi smartphone, tablet, PC an laptopê vê xizmetê bikar bînin. Ger wergêran bi rêya tîlefônê hate kirin, hûn tenê neçar in ku bersiva tîlefônê bidin.


Pêdivî ye ku bêtir tedbîr neyên girtin. Heke pirsên we hene, ji kerema xwe bi saziya perwerdehiya zarokê xwe re têkilî daynin.

Kîjan saziyên perwerdehiyê dikarin vê pêşniyarê bikar bînin?

Pêşniyar ji bo hemî **saziyên perwerdehiya seretayî** û her weha **dibistanên seretayî** û **navîn** ên li Awisturyayê ye.

Ji kerema xwe rasterast li saziya perwerdehiya zarokê/a xwe bipirsin ka gelo ev xizmet heye an ta çi radeyê heye, û daxwaza xwe ya wergêranê eşkere bikin.

Heke ev xizmet hîn tune, saziya perwerdehiyê heke bixwaze, dikare ji bo beşdarbûnê li bildung@savd.at qeyd bike.



Mesrefa pêşniyarê çiqas e?



Êv proje ji hêla Fona Civakî ya Ewropî ve tê fînansekirin wekî beşek ji bersiva Yekîtiya li ser pandemiya COVID-19, ku tê vê wateyê ku dema ku hûn bikar tînin mesrefa wê tune ye.

Ji bo kîjan naverokê û pêşniyar çawa dikare were bikar anîn?


Xizmetên wergêranê dikare bi gelek awayan were bikar anîn: Bê guman, bi taybetî di dema hevdîtinên plansazkirî yên bi perwerdekarên re (mînak, di dema hevdîtinên bicî yên zarok-dêûbav-mamoste da), di heman demî de ji bo hevpeyvînan berdewam bo nimûne, dema ku zarokê xwe radikin. Pêşniyar dikare ji hêla saziya perwerdehiyê ve ji bo mîhengên takekesî were derxistin (mînak, di dema hevdîtinên dêûbavan) û her weha ji bo mîhengên komê (mînak, di hevdîtinên demê êvari yên dêûbavan de).



Kengi u bi kîjan zimanan wergêran tê sazkirin?


Xizmetên wergêranê dikare rojên hefteyê ji 7:00 danê sibê heya 7:00 êvarî. – di mehên havînê de jî.

- Bi tevahî 34 zimanên ciyawaz (di gel zimanê nîşanan) têne pêşkêş kirin.
- Wergêran mimkin dibe di çend hûrdeman de, bi yek ji 17 zimanên ku harî zêde hewce dibin. (Tirkî, Bosnî / Xirwatî / Sirbî, Erebi, Dari, Farisî, û htd.)
- Ji bo zimanên din, bi gelemperî wergêran dikare di nav çend rojan de were berhem anin. Heya ku kêman caran zimanên rû didin (mînakî Hindî, Urdurdûyî) jî ji hêla xizmetê ve têne berhem anin.
- Hûn dikarin hemî agahdarîyan jî bibînin li www.bmbwf.gv.at/videodolmetsch



Erê ev hevpeyvîne bi nihênî ne?

Erê. Li gorî berjewendiya parastina agahîyê, wergêranbi rêya pergala şîfrekirî tê kirin. Naveroka hevpeyvînan bi nehênî tê destgirtin û di bin tu mercan de nayê tomar kirin û derbas kirin. Hemî wergêrên jêhatî girêdayî nehîniyê ne û daxuyanîya parastina agahîyê îmze dikin.



Ev proje ji hêla Fona Civakî ya Ewropî ve tê fînansekirin, wekî beşek ji bersiva Yekîtiya ji pandemiya COVID 19 re.

Şop

Xwedî, weşanger û edîtorê medyayê:

Wezaretê Perwerde, Zanist û Lêkolînê ya Federal
Minoritenplatz 5, 1010 Viyana

+43 1 531 20-0

Sêwirandin: BKA Design & Grafik

Photo credits: karo.linagraphic/Shutterstock.com (cover)

Viyana, Adar 2021

bmbwf.gv.at/videodolmetsch